Cegerxwîn kî ye?

Silêman Demir



Cegerxwîn sala 1903 an li gundê Hesarê hatiye dinyayê. A rast ku baş ne nayê zanîn sala çêbûna wî 1900 e ya jî 1903 ye. Her çi qasî ku di nasnameya wî de 1903 hatibe nivîsîn jî. Navê bavê wî Hesen e, ê dêya wî Eyşan e. Navê Seydayê Cegerxwîn yê rast Şexmûs e.

Hîna gava Cegerxwîn biçûk e, dê û bavê wî ji ber belengaziyê û pevçûnên gundiyan ji Hesarê bar dikin. Piştî ku çend salekî bi rê de li hin gundan dimînin, tavilê digihijin Amûdê, bajarê kurdan yê li Sûriyê ku wî çaxî di bin destê Fransa de bû. Sala 1918 an bavê wî li wir dimire. Gava sal dizîvire a din, yanî 1919 an îcarê dêya wî ji dimire.

di destpêka sala 1937 an û 1938 an de, Cegerxwîn û hin hevalên xwe komeleyekê bi navê Ciwankurd li Amûdê vedikin. Karê kurdewarî dikin.

Serê sala 1946 an mala xwe ji wir bar dike Qamişlo.

Wê salê ew û hin kurdên din dikevin nav kar û barên siyasî. Civata Azadî û Yekîtiya Kurd ava dikin. Dr. Ehmed Nafiz dibe serok û

Seyda bi xwe jî dibe sekreterê yekem.
Sala 1949 an dibe hevalê komunîstan û piştî demekê tê girtin. Sala 1954 an dibe berbijêrê parlementoya Sûrî, gelek Kurd dengên xwe didin wî, lê dernakeve û nabe endamê parlementoyê. Sala 1957 an ji komunîstan vediqete.
Lê Seyda ji a xwe danakeve, doza mafê kurdan dike û ew û komunîst wilo, hêdî hêdî bi hev dikevin û Seyda bi dû re ji wan vediqete.

Cegerxwîn radibe sala 1959 an diçe Iraqê, diçe Bexdayê. Serê pêşî hinekî di radioya wir de dixebite û bi dû re li Zankoya Bexdê wek mamostê kurdî kar dike.

Kurd li Şeqlawa dicivin û dikin biryarekê ji bo alfabeyeke hevbeş ji bo kurdan bigirin. Kurmanc û Soran tev li hev in û civîn, civîna hemû kurdan e. Lê gava civîn dest pê dike, zû dubendî dikeve nav wan. Bahdînî û Cegerxwîn dixwazin ku latînî bibe alfaba kurdî û kurdan, lê soran dibin piştgirên a bi tîpên erebî. Piştî gelek qirqirê, biryar tê girtin ku wê alfabe a bi tîpên erebî be, lê yek, ya jî du ders bi latînî û kurmancî bin.

Sala 1962 an piştî Cegerxwîn vedigere Sûrî, çend caran tê girtin û berdan. Ew demekê nefî bajarê Siweyda dibe, li jêra Sûrî ye, li ser hidûdê Îsraîl e, bajarê Durziyan e.

Gava cezayê Cegerxwîn yê li Sweyda xelas dibe û vedigere Qamîşlo, dewlet wî rehet nahêle. Sala 1969 an direve, diçe ba serhildana di pêşengiya Mistefa Berzanî de. Dor salekê li wir dimîne, digihije ku gelek kesan nas bike û rewşê fam bike. Çend caran bi Berzanî re rûniştiye û şier jê re xwendine. Li gora ku tê gotin, M. Berzanî gelekî ji şiera wî ya bi navê Dîkê Xerzan hez dikir. Li gora ku Keyo ji min re got, Cegerxwîn digot ku Berzanî gotiye ew şier rewşa Kurdan eşkere dike. Û her wilo gelek caran li pêş Cegerxwîn ji ên li dora xwe re gotiye gava Cegerxwîn hat, wî li tu deveran nesekinînin, bila rast bê ba min, ew şairekî me Kurdan ê mezin e.

Gava Cegerxwîn dîsa vedigere Sûrî, zû kifş dibe ku ew nikare li wir bijî, dîsa rev derdikeve ber wî, lê vê carê direve Lubnanê. Sal 1973 ye. Dîwana xwe ya bi navê KÎME EZ ku a sisêyan e, li wir dinivîse. Çîroka bi navê Salar û Mîdya jî çap dike. Seyda heta sala 1976 an li wir dimîne û vedigere Sûrî. Lê piştî sisê salan, yanî sala 1979 an bar dike Swêd. Heta ku diçe rehmetê li wir dimîne. 22-10-1984 an li Stockholmê diçe rehma Xwedê.

Melle Şexmûs bû Cegerxwîn

Şêxmûsê xwendina olî bû Cegerxwîn. Ew çawa bû, çi ew kir Cegerxwîn.? Bêguman evîna azadiyê û a Kurdistanê ye.

Ew bi ger û xwendina xwe fêrî gotar, çîrok û serpêhatiyan bû, fêrî adet, tecrube û axavtinê bû. Mirov û eşîrên cuda nas kirin, gund û bajarên kurdistanê dîtin. Zimanê wî, wilo bi gotinên nû û guhertî xurt bû. Fêrî rist û qesîdeyên nû bû. Seyda bi van sedeman û bi vî awayî hêdî hêdî ji mirovên der û dora xwe xurtir bû û hêla wî ya pêşevanî û rêberiyê ava bû û derket pêş.

Şagirtê xwendina olî Şêxmûsê xort rojekê li Qerejdaxê Şewqî Begê Erxenî dibîne. Ew camêr ji wan re bahsa Kurdan, bindestî û heqên wan, kar û xebata wan û serhildanên ku dê bibin dike. Seyda bi baldarî lê guhdar dike. Bi wê guhdarkirinê bingehê fikir, bawerî û hêviyên wî yên ku heta wê rojê li ser bingehê ola wî hatibûn avakirin dihejin, sist û lawaz dibin, êdî nema karin cîhê xwe nedin yeke xurtir, yanî welatperwerî, a ku nû wek hêvî û bawerî dikeve dilê wî û hêdî hêdî dibe a herî xurt.

Wî çaxî, gava hîna xwendevan e, dest pê dike û xwe bêtir dide nivîsandina helbestan. Navê wî wek Cegerxwîn ji xwe li nav xelkê belav bûye û pê serbilind e. Di bîranînên xwe de dibêje ku rojekê bang wî dikin û dibêjin "wa Mîre Botan hatiye û dixwaze te bibîne".

Gava Seyda dest pê dike û helbestan ji bo Hawarê ji Mîr re dişîne, navê Cegerxwîn bi kar tîne. Nevê Cegerxwîn wilo jê re dibe navê wî yê yekem.

Şairê neteweyî Cegerxwîn

Carinan di hin helbestên Seydayê Cegerxwîn de, ji ber sansora ku bi şiklê qedexebûna li ser kirina doza kurdan û li ser zimanê kurdî heye, navê kurdperweriyê jî dibe evîn.

Cegerxwîn di derheqa hemû tiştan de bi cesaret dinivîsî. Her wilo ew di wext de, yanî heger ku di derheqa tiştekî de binivîsiya, hîna gava bûyer germ û aktuel bû dinivîsî. Şiyar bû, dibihîst bê lêger û xwestina xelkê çi bû, dikarin ji çi hez bikin. Her wilo, wî gelek caran melodî û muzîk jî dida helbestên xwe û dida xelkê. Gelek helbestên xwe ji bo ku bibin klam dinivîsîn. Klambêjan ji helbestên wî hez kirin, bi hêsanî kirin klam û gotin. Vê yekê kir ku Seydayê Cegerxwîn zûtir bikeve nav xelkê, bê naskirin, nav û dengê wî bê belavkirin û jê bê hezkirin. Gelek stranên Aram, helbestên Seyda ne.

Wê demê xwendin kêm bû, nivîsandin pir hindik bû. Cegerxwîn bi jîrî xweş fam kiribû ku ew rê, yanî rêya belavkirinê ya ku helbest bibe stran, rêyeke belavkirinê û ragihandinê ya baş e. Ji ber vê yekê, him ji wê rêyê hez dikir û him jî bi heter dikir. Ma ya na wê Cegerxwîn

çawa bi gilî, bang, xwestin û gazinên xwe bigihişta heta ba gundiyên nav çiyan ên ku xwendin û nivîsandin nizanîbûn.

Hin ji helbestên wî bûn klamên kurdan yên ku hemû kurdan bihîstin û jê hez kirin. Wek helbesta wî ya ku Aram dibêje:

Tenê hiştim ay dil îşev çima çû
Wî ez kuştim ay dil îşev çima çû
Rabe pey keve ay dil zû wî werîne

Cegerxwîn şairê demeke dijwar e, lê ji hêlekê ve bi şens e. Gava ku wî helbest dinivîsîn, tu kesên din ên ku bikaribin xwe bidin ber wî û helbestên ku bibin stran binivîsin, li herêmê tune bûn.
Seydayê Cegerxwîn bala xwe xweş dabû berhemên Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqiyê Teyran. Fam kiribû bê wan çawa nivîsandibûn, kîjan karîbûn bibûna klam û qesîde. Her wilo Seyda bala xwe baş dabû klamên gelêrî, fam kiribû bê ji bo ku bibin klam divê çawa bin.

Bi min, yek ji biserketinên Seydayê Cegerxwîn jî, ji xwe di hêza wî ya di vir de ye. Ew lawê xelkê bû, bi ziman û mantiqê xelkê, ji xelkê re dinivîsî, dikir klam û dida wan. Xelkê jî ji wan hez dikir.
Di nav kurdên herêmê de, hema bibêjin ên ku nizanin hinekî ji vê helbesta wî ya ku wek klam dihat gotin, bistirên, tune ne:

Welatê kurda tev xêr û bêr e,
Hemî maden e tev zîv û zêr e,
Lê çi bikim îro maye j´xelkê re.

Welatê kurdan hemî çîmen e,
Egîd û şêr û piling tê hene,
Hemî heval û pismamên me ne.

Cegerxwîn, dengê bindestan bû, lê pêwendiyên wî bi hemû tebaqeyên civata kurdan re hebûn, dan û stendinên wî bi serdestên kurdan re jî xweş bûn. Vê yekê jî alîkarî pê re dikir ku Seyda bibe dengê hemû kurdan û bikaribe dengê xwe rabigihîne.
Cegerxwîn wilo dibe Şairê kurdan ê neteweyî. Ji ber ku ew xwestinên xelkê peyde dike, dinivîse û ji wan re dibêje, digihije wê payedariyê. Bi wî awayî ew bersiva xwestin û hewcedariyên xelkê, yên netewa kurd dide. Piraniya hemû çîn û hêlên netewî, wî mezin

qebûl dikin û jê hez dikin.

Seyda di derheqa hemû tiştan de dinivîsî: evîn, dîrok, ziman, civak û belengazî, aştî, şer, olî, fîlozofî û bûyerên navnetewî. Gava Seyda dida xuyakirin ku ji van hêlan tevan haydar e, zanê ye û jê fam dike, xelkê bêtir rûmet dida wî û karê wî.

Cegerxwîn bi alîkariya Mîr Celadet û Kamîran Bedirxanan li ewrûpa hat naskirin û belavkirin. Berhemên wî wilo gihan Fransa, Almanya û Brîtanya. Rûs jî berhemên wî li wir dibînin û bi xwe re dibin sovyetistanê. Kurdên wir, wî wilo nas dikin. Komunîstbûna wî dike ku kurdên li welatên sovyetan bikaribin wî derxin pêş, hin berhemên wî biweşînin û belav bikin.

Seydayê Cegerxwîn, wilo bû; ew mamoste, pêşevan û rêber bû. Di edebiyata hin welatên roava de, ji bo kesên wilo profet tê gotin. Gotina profet, tê maneya pêxember (peyamber). Ew, ên ku dikin demê û jiyana demê ya nexweş û ne bi edalet biguherin û baştir bikin. Profet, neheqiyan û jiyana xelkê ya bi êş dibînin, çareyan jê re peyde dikin, ji bo wan dibin mamoste, rêbêr, pêşevan û hewl didin da wan bibin rojên xweş ên ku ew karin wilo ji mêj ve bibînin, ên ku ji wan ve xuya ne.

Bêguman Seydayê Cegerxwîn him bi kar û kirinên xwe yên siyasî û civatî û him jî bi helbestvaniya xwe, ji rexneyan xelas nabe û her wilo bêguman ne azad e jî. Heger mirov bixwaze, mirov kare şaşiyên rêzimanî û huneriya helbestvaniya wî de, di helbestên wî û kitêbên wî yên din de peyde bike. Lê bi min a ku di helbestvaniya Cegerxwîn de girîng e û serdest e, ew hêla wî ya xurt a pêşevaniyê û mamostetiyê ye. Wî ew yek bi merdî, bi cesaret û bi jîrî dikir û xwe wilo gihand payedariya ŞAÎRÊ kurdan.

Berhemên Cegerxwîn

Heta niha heşt Dîwanên Cegerxwîn derketine û yek jî wê derkeve:

1-Dîwana yekem: Prîsk û Pêtî, 1945 Şam
2-Dîwana duyem: Sewra Azadî, 1954 Şam
3-Dîwana sêyem: Kîm e Ez, 1973 Bêrûd
4-Dîwana çarem: Ronak, 1980 Stockholm
5-Dîwana pêncem: Zend-Avista, 1981 Stockholm
6-Dîwana şeşem: Şefeq, 1982 Stockholm
7-Dîwana heftem: Hêvî, 1983 Stockholm
8-Dîwana heştem: Aştî, 1985 Stockholm

Seydayê Cegerxwîn her wilo kitêbên ku ne helbest in jî nivîsîne. Li ser ziman, dîrok û ferheng.